



**Dayik û bav û serwerên perwerdeyê yên rêzdar,  
Ji ber rêbaza nû ya Desthilata Herêma Niedersachsenê divê em we li ser van  
erkan agahdar bikin:**

### **Rêbazên seredanê**

- Serê her nexweşekî dikarin bi tenê du kesên nêzîkî wî derbasî nava nexweşxanê bibin û divê navê wan kesan bi duristî were gotin. Û ji ber ku bi tenê yek kes dikare berdewam li ba nexweş ba, ew her du kes dikarin xwe bi hev biguhêzin. Dibe ku mirov bikaribe di rewşên tenduristî yên dijwar de çareyeke taybet peyda bike.
- Divê navên herdu kesan bi duristî werin ragehandin û guhertina kesê duyem çênabe. Heger kesekî ji wan herduyan li ba zaroka xwe raze, ewê bendikekî destan bidine wî. Wekî din, ew herdu kesên bi mirovê nexweş re hatine nexweşxanê karteke derbasbûnê didine wan, ku divê wê li ber dergehê nexweşxanê nîşanî wan bidin. Ji kerema xwe bila nasnameyek yan belgeyeke din ya fermî her dem li ba te hebe.
- Hemî kesên din – xwîşik û bira jî – ÇÊNABE ji ber rêbazên ji hev dûrketinê derbas bidin, tenê zarokên şîr misogir in, ne bihtir.
- Her kes, ji bilî kesên nexweş, divê li ber dergehê nexweşxanê belgeke binefşî tije bike. Ji kerema xwe bila ew belga tomarkinê li dema mayîna te li nexweşxanê li ba te be û tenê dema tu ji avahiyê derketî dîsa li wan vegeêrîne! Piştî ku te navê xwe li ba navenda ambulansê û hembêzkerinê nivîsand, ji kerema xwe yekser her wî beşê destnîşankirî û li wê derê li ba karmendan xwe qeyd bike.

### **Erkê bikaranîna maskê**

- Hemî kes divê li nava nexweşxanê berdewam maskê bikarbînin, hem di odeyên nexweşan de jî. Mirov dikare tenê li dema razanê û xwarinê maskê ji ber dev û bêvila xwe rake.
- Maskên paçî misogir in, heger paqij bin û ne şil û ter bin û heger bêvilê û devî jî baş bigirin. Sermal yan çarîk û stûmal çênabe bi şûna maskê werin bikaranîn!

### **Ji kerema xwe hay ji rêbazên paqijyê yên bingehîn hebin**

- Berî derbasbûna hundirê nexweşxanê û hem odeya nexweşan û derketina ji wan ji kerema xwe her dem destên xwe bi dermanê mîkrobkuj paqij bikin.
- Ji kerema xwe bi kêmanî 1,5 metroyan ji hev dûr bikevin
- Çênabe ku mirov lepikên parastinê yên xwe bikarbîne, ji ber ku êdî mirov wê nikaribe baş destên xwe bi dermanê mîkrobkuj paqij bike.
- Divê mirov her dem hay ji rêbazên kuxîn û pişkîne hebe (di zenda xwe de).

***kurdisch***